



Navê Orijînal / Orijinal Adı:

UHUVVET RİSALESİ

(Kürtçe Tercümesi)



Kurdiya wê / Tercüme: Ayhan Yıldız

Teshîh: Ramazan Çetin



Weşanxane / Neşreden:

Hizmet Vakfı Yayınları

Piyerloti Caddesi Dostlukyurdu Sokak No:10/2

34192 Çemberlitaş / İstanbul / Türkiye

tel: +90 212 516 20 49 fax: +90 212 517 77 58

e-mail: info@hizmetvakfi.org

www.hizmetvakfi.org

Sertifika No: 1206-34-003292



Çapxane / Baskı:

Elma Basım

Halkalı Cad. No: 164 B4 Blok Sefaköy / İstanbul

tel: +90 212 697 30 30

İSTANBUL - KASIM 2012

Çapa Yekemîn / Birinci Baskı



ISBN: 978-975-6321-86-7



© Copyright

Hemû mafên çapê yê berhemê yê Hizmet Vakfı Yayınlarıyê ne.

Bu eserin, tamamen veya kısmen tüm telif hakları "Hizmet Vakfı Yayınları"na aittir.

Ji Kulliyata Rîsaleyên Nûr

Rîsaleya Uxuwwetê

Muellif:

**Bedîuzzeman
Seîdê Nûrsî**

Nîşe:

*Meal û ravekirinên di têbiniyan de yên
ayet û hedîs û metnên din di eslê metnê
de nîn in, ji aliyê wergêr ve lê hatine
zêde kirin.*

NAMEYA BÎST Û DUDUYAN

بِسْمِهِ وَإِنْ مِنْ شَيْءٍ إِلَّا يُسَبِّحُ بِحَمْدِهِ¹

[Ev name, du beş e. Beşa Pêşî, ehlê îmanê
vedixwîne uxuwwet û muhebbetê.]

BEŞA PÊŞÎ

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

إِنَّمَا الْمُؤْمِنُونَ إِخْوَةٌ فَأَصْلَحُوا بَيْنَ أَخَوَيْكُمْ *
ادْفَعْ بِالَّتِي هِيَ أَحْسَنُ فَإِذَا الَّذِي بَيْنَكَ وَبَيْنَهُ عَدَاوَةٌ
كَأَنَّهُ وَلِيٌّ حَمِيمٌ * وَالْكَاظِمِينَ الْغَيْظَ
وَالْعَافِينَ عَنِ النَّاسِ وَاللَّهُ يُحِبُّ الْمُحْسِنِينَ²

1 Bi navê Wî * Ti tişt tune ye ku bi tesbîhkarî hemdê Wî neke. (Sûreya Îsra: 44)

2 Mumîn, ancax bira ne. Nexwe navbera [wan] birayên xwe [yên ku nava wan xera bûye] biselihînin. (Sûreya

Terefgirî, înad û heseda ku di nav mumînan de dibe sedema nîfaq û şîqaqê; kîn û edawetê, ji hêla heqîqet û hîkmetê û Îslamiyeta ku însaniyeta mezin e ve, ji hêla jiyana şexsî û jiyana civakî ve û ji aliyê heyata manewî ve çirkîn, kirêt û redkirî ye û zerarê wê zêde ye û zulm e û ji jiyana mirovahiyê re jehr e. Em ji wan gelek aliyên wê yên zaf, “Şeş Alî”yan beyan dikin:

ALIYÊ PÊŞÎ: Di nezera heqîqetê de zulm e.

Hey mirovê bêînsaf ku li hember mumînan kîn û xerez û dijminahiyê di dilê xwe de dihawîne! Çawa gava ku tu, di keştiyekê de yan jî di xaniyekê de bî û tevî te, neh masûm û yekî canî hebe û mirovek bê, bixwaze ku wê gemiyê xerq bike û wî xaniyê îhraq bike, tu baş dizanî ku çiqas zulm dike û helbet tu dê wisan biqîrî ku tu bi dengê xwe, zalimtiya wî bigihînî esmanan. Hetta heke yek masûmek û neh canî bin jî, dîsan ew gemî, li gor ti qanûnekî edaletê nayête noqkirin.

Hucûrat: 10) * Tu bi awayekî herî baş pêşî [li nebaşiyê] bigre. Wê hingê ew kesê ku di navbera we û wî de dijminatî heye, dê bibe dostekî jidilûcan. (Sûreya Fussilet: 34) * (Ew kesên biteqwa) ku xeyza/hêrsa xwe dadîqultînin, mirovan efû dikin û Ellah, ji muhsînan hez dike. (Sûreta Alî Îmran: 134)

Eynî wisan, **di wucûda mumînekî de ku ew, xaniyekî Rebbanî û sefîneyeke Îlahî ye, sifetên mîna îman, Îslamiyet û cîrantiyê, ne neh sifet, belkî bîst sifetên masûm hene. Îca digel vê yekê jî, ji ber sifeteke wî ya canî ku li gorî te, ji te re muzir e û li xweşa te naçe, tu rabî pê re bikevî kîn û xerez û dijminahiyê û bi vî awayî yan teşebbus bikî, yan jî bixwazî ku wî xaniyê manewî yê wucûdê, ji aliyê manewî ve xerq bikî û îhraq bikî, xerab bikî û noq bikî, mîna wê, wisan zulmeke şenî û xeddar e.**

ALIYÊ DUDUYAN: Hem di nezera hîkmetê de jî zulm e.

Çunkî malûm e ku neyartî û hezkirin, mîna nûr û zulûmatê, dijberî hev in. Her du, di wateya xwe ya heqîqî de, nikarin bi hev re, tevî hev bimînin.

Heke muhebbet, li gor rûchaniyeta sedemên xwe, di dilekî de, bi awayekî rastî hebe, helbet wê gavê dijminahî, dibe mecazî û dimîne û werdigere sûretê şefqetê. **Belê, mumîn, ji xwişk û birayên xwe hez dike û divê hez bike. Îca ji ber nebaşiya wî/wê, tenê dilê wî pê diêşe. Ne bi darê zorê, belkî bi lutûf û xweşiyê, ji bo îsleha wî/wê hewl dide. Ji ber vê ye ev delîla hedîsê ku wiha ye: “Zêdetirî sê rojan, mumîn dê ji mumînan nexeyide û dê qet’a xebirdanê pê re neke.”**

Heke ji ber zêdebûna sedemên dijminahiyê, dijminatî bi ser bikeve û bi awayekî heqîqeta xwe di dilekî de bi cî bibe, wê gavê muhebbet, dibe mecazî û dikeve sûretê tesennû û altaxî û melaqiyê.

Hey mirovê bêînsaf! A niha binihêre bê ka kîn û dijminahiya bi birayê mumîn re çi qas zulm e. Çunkî çawa gava tu bibêji ku kevîrên adî yên piçûk, ji Kabeyê girîngtir in û ji Çiyayê Uhûdê mezintir in, tu bêaqiliyeke kirêt/çirkîn dikî. Eynî wisan, **hîn qusûrên ku dibin sedemê dijminatiya te ya bi birayê te yê mumîn re jî, di hukmê wan kevîrên adî/reş de ne; lê belê Îslamiyet, di hurmeta Kabeyê de ye û di ezemeta Çiyayê Uhûdê de ye û hîna gelek wesfên Îslamî hene ku muhebbet û ittîfaqê dixwazin. Ha digel vê yekê, dîsan jî gava ku tu rabî li hember îman û Îslamiyetê, tercîha xwe bidî ser wan, terka muhebbetê bikî û bidî dû dijminahiyê, wisan zêde bêînsafî ye û bêaqilî ye û zulmeke gelek zêde mezin e ku heke aqilê te hebe, tu dê fêm bikî.**

Erê, tewhîda îmanî, helbet yekîtiya dilan divê; îca wehdeta îtîqadê, wehdeta civakî iqtîza dike. Belê, tu nikarî vê înkâr bikî: Gava di tabûrekê de, tu bi yekî re bimînî, bi te re, li hember wî, pev-girêdaneke dostane çê dibe û ji ber ku hûn her du, di bin fermanê femandarekî de bi hev re ne, di navbera

we de têklidariyeke hevalî çê dibe û di dilê te de eleqedariyek bi wî re çê dibe û gava ku tu bi yekî re di heman welatî de bimînî, bi te re li hember wî, pêjn û hesta munasebeteke uxuwwetkarane peyde dibe. Îca hal ku hal e, **nûr û şuûra ku îman dide te û bi qasî hejmara wan Îsmên Îlahî ku nîşanî te dide û te pê agahdar dike, eleqeyên wehdetê û rabiteyên îttîfaqê û têkilîdariyên uxuwwetê hene.**

Mesela Xaliqê we her duyan yek, Malikê we yek, Mabûdê we yek, Raziqê we yek... yek, yek, heta hezarî yek, yek. Hem pêxemberê we yek, dînê we yek, qîbleya we yek... yek, yek, heta sedî yek, yek. Peyre gundê we yek, dewleta we yek, welatê we yek... heta dehan yek, yek. Digel ku ev qas yek yekên ha wehdet û tewhîdê; wîfaq û îttîfaqê; muhebbet û uxuwwetê îqtîza dîkin û digel ku zincîrên wisan manewî hene ku dikarin kâinat û kureyan bi hev de girê bidin hene, dîsan mirov rabe wan tiştên mîna konê pîrê bê qîmet û qels in û dibin sedemê şîqaq û kîn û dijminahiyê û mirov dîsan jî wan tercîh bike û mirov li hember mumînan bi awayekî heqîqî dijminahî bike û kîna wan bixe dilê xwe, ka çi derece li hember rabiteya wehdetê bêhurmetiyeke çawan e û li hember wan sedemên muhebbetê piçûkxistineke çawan e û li hember wan munasebetên uxuwwetê, zulmeke çi qas mezin e,

neheqiyeye çawan e, heke dilê te nemiribe û aqilê te netefiyabe, helbet tu dê fam bikî.

ALIYÊ SISÊYAN: Li gor sirrê

وَلَا تَزِرُ وَازِرَةٌ وِزْرَ أُخْرَىٰ¹

ku edaleta mehza îfade dike, ji ber sifeteke canî ku di mumînekî de heye, tu, rabî sifetên wî yên dî ku masûm in, mehkûm bikî, ev dibe neyartî, kîn û xerez. Îca ev ku heye, heqîqet, şerîet û hîkmeta Îslamî, bi bîra te dixe ku zulmeke gelek zêde bêhed e û bi ser de jî îca gava tu ji yek sifeteke nebaş a mumînekî dilê xwe teng bikî û bixeyidî û rabî îca bi eqrebayên wî mumînî re jî neyartî bikî, li gor vê sîxeya

mubalexeya إِنَّ الْإِنْسَانَ لَظَلُومٌ¹ ê tu zulmeke gelek ezîm dikî. Ha digel vê bibîrxistinê jî, ka bi çi awayî tu xwe mafdar dibînî û dibêjî: “Heqqê min heye.”

Di nezera heqîqetê de, ew nebaşiyên ku şerr in û dibin sedemê dijminahiyê, mîna şer û axê, kesîf in. Divê ku sîrayetî kesekî dî nekin û neteyisin kesî dî. Heke kesekî dî jê ders bigre û şer bike, ew meseleyeke dî ye. Îca ew qencyên ku sedemên muhebbetê ne, mîna muhebbetê, nûr in, şana wan

1 Ti gunehkarek, barê gunehkarekî/e dî, hilnagre ser xwe. (Sûreya Fatir: 18)

e ku sîrayet bikin û biteyisin. Ha ji ber wê ye ku ev gotina “Dostê dostan, dost e.” gihîştiye wê dereceyê ku ketiye nav gotinên pêşîyan. Hem ji ber vê ye ku ev gotina “Mirov hezar çavî dide xatirê yek çavekî.” ji ser zar û zimanan kê nabe.

Va ye hey mirovê bêînsaf! Digel ku heqîqet wiha dibîne, dîsa tu rabî ji rûyê mirovekî ku tu jê hez nakî, li hember eqreba û birayên wî yên xwînşîrîn û masûm jî, dijminahiya xwe bi giştî bikî, ev çiqas zêde xîlafê heqîqetê ye, heke tu heqîqetbîn bî, tu dê fam bikî.

ALIYÊ ÇARAN: Di nezera jiyana şexsî de jî zulm e. Weke asasê vî Aliyê Çaran, li çend dustûran guhdarî bike:

A yekê: Gava ku te meslek û fikrên xwe heq dît, heqqê te heye ku tu bibêjî: “**Mesleka min heqq e, yan jî xweşiktir e.**” Lê belê heqqê te tune ye ku tu bibêjî: “**Tenê mesleka min heqq e.**” Li gor sirrê

وَعَيْنُ الرِّضَا عَنْ كُلِّ عَيْبٍ كَلِيلَةٌ
وَلَكِنَّ عَيْنَ السُّخْطِ تُبْدِي الْمَسَاوِيَا¹

1 Çavê dostanî û razîbûnê, ti eybekê nabîne. Lê belê yê ku bi dijminahî li her tiştî binêre, hemû xirabîyan radixe ber çavan. (Dîwanuş-Şafîî: 120; Edebudunya wed Dîn: 57)

ew nêrîna te ya bêînsaf û fikra te ya jiqîmetketî
nikare bibe hakem û nabe ku nêrîna te, mesleka
xelkê mehkûmî batiliyê bike.

Dustûra Duduyan: Li ser te heqq e, her çi tiştê
ku tu bibêjî, bila heq be; lê belê heqqê te tune ye ku
tu her heqqiyê bibêjî. Her çi tiştê ku tu dibêjî, divê
ku rast be, lê belê ne rast e ku tu, her rastiyî rast
bibêjî. Çunkî mirovekî mîna te ku niyeta wî ne xalis
e, gava nesîhet dike, carinan li telê mirovan dikeve
û eksulemel dike.

Dustûra Sisêyan: Heke tu bixwazî ku neyartî
bikî, li hember wê neyartiya ku di dilê te de ye
dijminahî bike û hewl bide xwe da ku tu wê, ji dilê
xwe bavêjî. Hem ê ku herî zêde zerar dide te, nefsa
te ya emmare û hewayaya nefsa te ye, li hember wan
dijminatî bike û hewl bide xwe ku tu wan îsleh bikî.
Ji bo xatirê wê nefsa xwe ya muzir, bi mumînan re
neyartî meke. Heke tu bixwazî dijminatî bikî, gawir
û zindîq gelek in; bi wan re neyartî û edawetê bike.
Erê, çawa ku sifeta muhebbetê, layiqî muhebbetê
ye, wisan jî xesleta edawetê bi xwe, berî her tiştî
layiqî edawetê ye. Heke tu bixwazî xesmê xwe
mexlûb bikî, li hember xirabî û fenatiya wî, bi
qencyê muamele bike. Çunkî heke tu bi xerabiyê
muqabele bikî, neyartî zêde dibe. Ji aliyê zahirî ve
mexlûb bibe jî, dilê wî kîn digre û neyartiyê berde-
wam dike. Îca gava ku tu bi qencyê muqabele bikî,

ew poşman dibe û ji te re dibe dost. Li gor hukmê

إِذَا أَنْتَ أَكْرَمْتَ الْكَرِيمَ مَلَكَتْهُ
وَإِنْ أَنْتَ أَكْرَمْتَ اللَّيْمَ تَمَرَّدًا¹

şana mumîn ew e ku kerîm be. Bi xêra îkrama te, ji te re dibe musexxer. Ji aliyê zahîrî ve leîm û çikûs be jî, ji hêla îmanê ve kerîm e. Belê, gelek hatiye dîtin ku gava tu ji yekî/e nebaş û fena re bibêjî “Tu baş î, tu baş î.” ew baş bûye û gava tu ji yekî/e baş re bibêjî “Tu fena yî tu ne baş î.” ew dibe nebaş û fena.” Nexwe, gohê xwe bide dustûrên qudsî yên Quranî yên mîna

وَإِذَا مَرُّوا بِاللَّغْوِ مَرُّوا كِرَامًا ﴿٦٠﴾ وَإِنْ تَعْفُوا
وَتَصْفَحُوا وَتَغْفِرُوا فَإِنَّ اللَّهَ غَفُورٌ رَحِيمٌ²

Seadet û selamet, di wê de ye.

1 Gava ku ji yekî xwedîşeref û xwedîîzzet re îkramê bikî, tu wî bi dest dixî. Gava tu ji yekî nebaş û dilxerab re qenci bikî, ew hîna zêdetir zeraî dide te û ji rê derdikeve. (Şerhu Dîwanul Mutenebbî: 2/11)

2 Gava rastî gotinên beredayî tî, bi awayekî kîramî/weqerî jê derbas dibin diçin (Sûreya Beqere: 72) * Heke hûn bibexşînin û qusûrên wan li nava çavê wan nedin û binixumînin, bizanîbin ku Ellah, gelek bexşîner, xefûr û rehîm e. (Sûreya Texabûn: 14)

Dustûra Çaran: Ehlê kîn û edawetê, hem li nefsa xwe, hem li birayê xwe yê mumîn, hem li rehmeta Îlahî zulm dike; êrîş dike. Çunkî bi kîn û edawetê, nefsa xwe di nav ezabekî elîm de dihêle. Ji ber wan nîmetên ku bi ser xasimê wî ve tên, ezabê bi nefsa xwe dikşîne û ji ber tirs û fikaran jî, elemê bi nefsa xwe dide kişandin; li nefsa xwe zulm dike. Heke edawet, ji hesedê/dexesiyê bê, îca jixwe ew bi temamî ezab e. Lewra hesed, pêşî kesê hesûd mehû dike, dişewitîne. Derheqê kesê ku jê hesed tê kirin de, jixwe zerarê wî hindik e, yan jî tune ye.

Çareya hesedê: Mirovê hesedvan, bila li encam û dawîya wan tiştên ku heseda wan dike bifikire; da fam bike ku ew xweşikî, qewet, mertebe û serweta dunyayî ku bi reqîbê wî re hene, fanî ne, demdemî ne. Feydeyên wan hindik in; lê zehmetê wan zêde ne. Îca heke tiştên ku pê re hene, meziyetên axretî bin, jixwe di wan de hesed nabe. Vêca gava di wan de jî hesed bike, yan ew bi xwe riyakar e; dixwaze ku malê dunyayê mehû bike; yan jî ew zenn dike ku kesê mehsûd riyakar e, her wiha neheqî dike, zulm dike.

Hem gava ku bi wan musîbetên ku tên serê wî kêfxweş bibe û ji ber wan nîmetên ji wî re tên dayîn, ew xembar bibe, wisan dibe ku ji qeder û rehmeta Îlahî ya ku qenciyan bi wî dike, dixeyide. Eynî mîna

ku qederê rexne bike, li hember rehmetê îtîraz dike. **Yê ku qederê rexne dike, serê xwe li orsê dide, dişkêne; yê ku îtîraza rehmetê bike, ji rehmetê marûm dimîne.**

Gelo kîjan însaf qebûl dike ku mirov, ji ber tiştêkî ku ne hêjayî neyartiya yek rojekê ye, îca salekê, bi kîn û edawetê muqabele bike û ka ev dikeve kîjan wicdanê xerabnebûyî? Hal ku hal e, nebaşiyê ku ji birayê te yê mumîn tê serê te, bi temamî ne ji wî ye û nabe ku tu jê bizanî û wî mehkûm bikî. Çunkî,

Serê pêşî, di wê de, payeke qederê heye. Divê tu wê derxî û li ber wê hîsseyê qeder û qezayê, bi razîbûnê muqabele bikî.

Ê duduyan, divê ku tu hîsseyê nefs û şeytên jî jê hilînî û ciyê ku tu dijminahî bi wî mirovî re bikî, ji ber ku ew li hember nefsa xwe mexlûb bûye, divê ku dilê te pê biêşe û li benda wî bisekinî ku ew poşman bibe.

Ê sisêyan, tu wan qusûrên ku di nefsa xwe de nabînî, yan jî naxwazî ku wan bibînî, bibîne, hîsseyekê jî bide wê. Peyre li hember hîsseyêke piçûk ku maye, bi wê efû û bexşîn û ulûwwêcenabiya ku mirov, bi awayekî herî biselamet û zû li hember xesmê xwe bi ser dikeve muqabele bike. Gava tu wisan bikî, tu ji zulm û zeraran xelas dibî. Na heke

tu wisan nekî, lê mîna Yahûdiyekî cewherfiroş
 ê serxweş û dîwane ku şîşe û parçeyên qeşayê, bi
 bihayê elmasê dikire, tu rabî ji bo wan karûbarên
 dunyayî ku ne hêjayî pênc pereyan in û fanî ne,
 zaîl in, demborî ne û bêqîmet in, lê mîna ku tu
 dê li dunyayê ebedî bimînî û ew jî dê ebedî bi te
 re bimînin, bi hirseke şedîd û bi kêneke daîmî, bi
 dijminahiyeke mutemadî muqabele bikî, bi sîxeya
 mubalexeyê, zelûmiyetek e, yan jî serxweşiyek e û
 bi awayekî ji awayan, dîwanetî ye.

Va ye, rê mede neyartî û vê fikra tolhildanê ku
 ev çend ji jiyana şexsî re zerarê wê heye –heke tu
 ji şexsê xwe hez dikî– nehêle ku bikeve dilê te. Îca
 heke ketibe dilê te, li gotina wê guhdarî meke. Bala
 xwe bide Hafîzê Şîrazî ku heqîqetbîn e û lê guhdarî
 bike:

دُنْيَا نَه مَتَاعِیْسَتِی کِه اَرَزْد بِنَزَاعِی

Ango “Dunya, ne metayeke wisan e ku hêjayî
 nîzayê be.” Çunkî, ji ber ku fanî û demborî ye, bê
 qîmet e. Îca gava ku ev dunyaya gir a qirase wiha be,
 tu dê fam bikî, ka ew karûbarên cuz-î yên dunyayê
 çi qas bê ehemmiyet in! Hem wî gotiye:

اَسَایِش دُو گِیْتِی نَفْسِیْرِ اَیْنِ دُو حَرْفَسْت
 بَادُوسِتَکَان مَرُوْت بَادُشْمَنَکَان مُدَارَا

Ango “Rehetî û selameta her du cîhanan, du herf tefsîr dîkin û didin qezenckirin: Ew jî ew e mirov bi dostan re muaşereta muruwwetkarane bike û bi dijminan re muameleya sulhkarane bike.”

Heke tu bibêjî: “Vîn, ne di destê min de ye; di xulqiyeta min de neyartî heye. Bi ser de jî wan zorê daye demarê min, êdî nikarim dev jê berdim.”

Bersiva wê: Heke mirov sû-ê xulq û xesleta neçê nîşan nede û heke mirov bi tiştên mîna xiybetê û bi pêdiviyên wê ‘emel neke û bi ser de jî gava mirov bi qusûra xwe jî bihese, zerar nake. Madem vîn û îrade ne di destê te de ye û tu nikarî dev jê berdî, îca gava ku tu qusûra xwe bibînî, ku ev ji te re dikeve hukmê wekî poşmaniyeke manewî û tobeyeke veşarî û îstîxfareke zimnî ye û gava tu fam bikî ku tu di wan xesletên nebaş de neheq î, êdî ev gişt, te ji şerrê wî xelas dîkin. Jixwe me ev name nivîsand ku îstîxfara manewî temîn bike, bi çavê heq li neheqiyê nenihêre û wî xesmê xwe yê mafdar, bi neheqiyê teşhîr neke.

Bûyereke ciyê baldariyê: Weqtakî, min dît ku ji ber encama wê terefgiriya xerezkar, yekî mutedey-yîn ê ehlê ilim, alimekî salih ê ku muxalifê fikra wî ya siyasî bû, wisan piçûk xist ku anî xist dereceya kafiriyê; eynî wî ehlê ilmê, îca munafiqekî ku di fikra wî de bû, bi hurmetkarî medih kir. Ha ji ber van encamên xerab ên siyasetê, ez hilveciniqîm û

min got “eûzu billahî mîneşşeytanî wessîyaseti” Ji wê rojê bi şûn de, ez ji jiyana siyasetê vekîşiyam.

ALIYÊ PÊNCAN: Beyan dike ku ji aliyê jiyana civakî ve, înad û terefgirî, gelek bi zarar e.

Heke bête gotin: Di hedîsê de hatiye gotin:

اِخْتِلَافُ أُمَّتِي رَحْمَةٌ

Îca îxtîlaf ku heye, bi xwe re terefgiriyê tîne û îqtîza dike. Hem jî ev mereza terefgiriyê, wan ‘awamên mezlûm, ji şerrê wan xewasên zalim diparêze. Çunkî, gava ku xewasên bajarekî, yan gundekî, hev bigrin, wan ‘awamên mezlûm dipelêxin. Îca gava ku terefgirî hebe, yên mezlûm, xwe dispêrin aliyekî û xwe xelas dikin. Hem ji qirêna fikran û ji texalufa aqilan, heqîqet bi temamî derdikeve holê.

Bersiva wê: Em ji pîrsa pêşî re dibêjin ku: Ew îxtîlafa di hedîsê de, îxtîlafa musbet e. Ango: Her yek ji wan, hewl dide ku mesleka xwe tamîr bike û ji bo rewaca wê dixebite. Ji bo xerakirin û betalkirina mesleka kesî dî na; belkî ji bo kemilandin û îsleha wan dixebite. Îca ew îxtîlafa menfî ku heye, ew e ku bi awayekî xerezkar û edawetkar, li xerakirina hev û dî dixebitin; ha ev, di nezera hedîsê de hatiye redkirin. Çunkî, yên bikevin qirik û gewriya hev û li hev rabin pêdarê, nikarin musbet hereket bikin.

Ji bo pirs a duduyan em dibêjin ku: Terefgirî, heke li ser navê Heq be, dibe ku ji bo kesên heqdar, bibe penagehî. Lê belê terefgiriya xerezkar a mîna îro ku li ser hesabê nefsê ye, ji neheqan re ciyê xwespartinê ye ku ji bo wan dibe ciyê piştgiriye. Çunkî gava şeytan bê ba mirovekî ku bi xerezkarî terefgirî dike û ji fikra wî re alîkarî bike, ew mirov dê rehmetê li şeytên bibarîne; îca heke mirovekî mîna milyaketan bê cem wî aliyê hemberê wî, dê neheqiyeke wisan nîşan bide ku haşa dê lanetê lê bike.

Ji bo pirs a sisêyan em dibêjin ku: Îca ew tesaduma fikran ku li ser navê Heq û li ser hesabê heqîqetê ye, digel ku di amanc, meqsed û asasan de îttîfaq dike, di wesîleyan de îxtîlaf dike. Her quncikê heqîqetê îzhar dike û ji heqq û heqîqetê re xizmet dike. Çi heye ku ji wê tesaduma fikran a ku terefgirane û xerezkarane ye û li ser hesabê nefsa emmare ya fîrawunbûyî ye û di terzekî wisan de ye ku xwedfiroşane û şohretperwerane ye, ne “barîqayê/zeraqê heqîqetê” belkî agirên fitneyan derdikeve. Çunkî digel ku lazim e di meqsedê de îttîfaq bê kirin, îca nuqtaya gihanhevî ya fikrên kesên wisan, tew di kureya erdê de jî tune ye. Ji ber ku ne li ser navê Heq e, bi awayekî bênîhayet, mufritane diçe. Dibe sedemê wan însîqaqên wisan ku ne qabilê îltiyamê ne. Rewşa alemê, ji vê re şahid e.

Elhasil:

اَلْحُبُّ لِلّٰهِ ❁ وَالْبُغْضُ فِي اللّٰهِ ❁ وَالْحُكْمُ لِلّٰهِ

ku dustûrên qedrgiran in, gava nebin dustûrên tevgeran, meydan û manaş ji nîfaq û şîqaqê re dimîne. Belê, gava nebêje

اَلْبُغْضُ فِي اللّٰهِ ❁ وَالْحُكْمُ لِلّٰهِ

û wan dustûran li ber çavan negre, ciyê ku bixwaze dê edaletê bike, zulm dike.

Bûyereke ciyê heyretê: Weqtekê, Îmamê Elî Rediyellahu enhu, kafîrek avêtiye erdê, şûrê xwe kişandiye û gava kiriye ku serê wî bibire, wî kafîrî tifî wî kiriye. Wî jî, ew kafîr berdaye, serî nebiriye. Wî kafîrî jê re gotiye ku:

“Te çima serê min nebîrî?”

Wî got:

“Min dê ji bo Xwedê bibiriya; feqet te tûyî min kir; ez hêrs bûm, paya nefsa min ketê û ji ber vê jî îxlasa min zededar bû. Lewre min serê te nebîrî.”

Wî kafîrî jê re got:

“Mebesta min pê ew bû ku ez te hêrs bikim; da ku tu zû serê min bibîrî. Madem dîne we ev qas safî û xalis e, ew dîn heqq e.”

Hem bûyereke ku medarê balkêşiyê ye:
Zemanekî, gava ku hakimek, destê yekî dizek dibire, pê re jî hêrs dibe û wisan dibire. Amirê wî yê ku bala wî li ser wî ye, ji ber vê yekê, wî ji wezîfeya wî digre. Çunkî heke li ser navê Şerîetê, li ser hesabê qanûnê Îlahî bibiriya, nefsa wî, dê pê biêşiya. Îca dê bi awayekî wisan bibiriya ku dilê wî, dê jê teng nebûya û hêrs nebûya, lê belê dê merhemet jî nekira. Nexwe diyar e, ji ber ku wî, di wî hukmî de ji nefsa xwe re jî hîsseyek derxistiye, wî ew kar bi edaletkî pêk neaniye.

Merezeke mudhîş a jiyana civakî ku ji rewşa civakî re ciyê xebînetê ye û dilê temamê Îslamê bi girî dixê:

Gava ku dijminên xaricî derdikevin û êrîş dikin, mesleheteke civakî ye ku mirov, neyartiyên hundirîn jibîra bike û dev ji wan berde. Hetta ew qewmên herî gundî û çiyayî jî, vê meslehetê teqdîr dikin û pêk tînin. Îca digel vê yekê, ka çi bi wan kesên ku dibêjin em ji vê Cemaeta Îslamê re xîzmet dikin bûye ku li hember van dijiminên ku li pişt hev ketine rewşa êrîşkariyê û hejmara wan jî bê hed e, ew wan neyartiyên xwe yên cuz-î jibîra nakin û ji êrîşa dijminan re zemîn amade dikin. Tevî ku ew qewmên herî gundî û çiyayî jî vê mesleheta civakî ya ku “gava ku dijminên xaricî derdikevin û êrîş

dikin divê mirov, neyartiyên hundirîn jibîra bike û dev ji wan berde” ye teqdîr dikin û li gorî wê tevdigerin; ka çi bi wan kesên ku dibêjin em ji vê Cemaeta Îslamê re xîzmet dikin bûye ku li hember van dijiminên ku li pişt hev ketine rewşa êrîşkariyê û hejmara wan jî bê hed e, ew wan neyartiyên xwe yên cuz-î jibîra nakin û ji êrîşa dijminan re zemîn amade dikin. Ev hal, berejêrdaketinek bi xwe ye û li jiyana civakî ya Îslamê, xiyanetek e.

Hîkayeyeke ku medarê îbretê ye: Du qebîleyên ji wê eşîra bedewî ya Hesenan hebûne ku neyarê hev û dî bûne. Digel ku van her du qebîleyan, hema hema nêzî pêncî mîrî ji hev kuştine jî, gava ku qebîleya mîna Sipkan an jî eşîra Heyderan derketa hemberî wan, wan her du taîfeyên ku neyarê hev bûn, ew neyartiya navbera xwe jibîra dikir û mil didan hev û heta ku wan ew eşîra xaricî defi’ bikira, wan ew neyartiya daxilî qet nedaniya bîra xwe.

De ha gelî mumînan! Ka hûn dizanin gelo çi qas dijiminên we ku di hukmê eşîran de ne hene ku li hember eşîra ehlê îmanê ketine weziyeta êrîşkariyê? Mîna wan daîreyên ku di nav hev de ne, belkî zêdetirî sed daîreyî hene. Digel ku em mecbûr in ku li hember her yeke ji wan, hev bigrin û dest bidin hev û em bikevin weziyeta xweparastinê, îca berevajiyê vê, me xwe li wê terefgiriya xerezkar û îrada

edawetkar girtiye, ev yeka ha, di hukmê wê yekê de ye ku em, karê wan ê êrîşê rehet û hêsa dîkin û em deriyan vedîkin da ku ew bikevin herêma Îslamê. De ka gelo, ev bi ti awayî li ehlê îmanê tê? Ew daîreyên dijmin, ji ehlê dalalet û îlhadê bigre heta alema ehlê kufrê, heta tirs û musîbetên dunyayê, wisan hene ku belkî heftê cûre dijmin hene ku li pişt hev, li hember we, ketine weziyeteke zerarkir û li pey hev, bi hîddet û hirsê li we dinîhêrin. Li hember van temaman, çeka te ya qewî û meterîs û keleha te, Uxuwmeta Îslamê ye. Îca bi edawet û hincetên piçûk, hejandina vê keleha Îslamê, çiqas dijberê wîdan e, çiqas xîlafê mesleheta Îslamê ye, bizanibe û were ser hemd û hişê xwe!

Di hedîsên şerîf de hatiye ku: Ew şexsên bidehşet û zerarkar ên axîrzeman ên mîna Deccal û Sufyan ku dê serokatiya nîfaq û zindîqiyê bikin, dê ji hirs û şîqaqa Îslam û mirovahiyê îstîfade bikin û bi qeweteke hindik, dê new'ê beşer herc û merc bikin û dê wê alema muezzem a Îslamê bixin bin esaretê.

Gelî ehlê îmanê! Heke hûn nexwazin ku hûn bi zelîlî bikevin bin esaretê, aqilê xwe bidin serê xwe! Li hember wan zalimên ku ji îxtîlafa we îstîfade dîkin, bikevin hundirê keleha qudsî ya

إِنَّمَا الْمُؤْمِنُونَ إِخْوَةٌ û xwe tê de biparêzin.

Nexwe ne hûn dikarin jiyana xwe muhefeze bikin, ne jî dikarin huqûqên xwe mudafee bikin. Malûm e, gava du qehreman bikevin qirika hev û dî, gedeyek, dikare li wan her duyan jî bide. Gava du çiya, di mêzînê de, li hember hev bikevin muwazeneyê, kevirekî piçûk, dikare muwazeneya wan xera bike; yekî derxe jor; yekî daxîne jêr. Va ye gelî ehlê îmanê! Ji ber wan îhtîrasên we û ji ber wan terefgiriyên we yên xusûmetkarane, hêza we dadikeve hîçiyê; dibe ku bi qeweteke hindik, hûn bipelixin. Îca heke têkiliya we bi jiyana we ya civakî re hebe, vê dustûra qedrbilind a

الْمُؤْمِنُ لِلْمُؤْمِنِ كَالْبُنْيَانِ الْمَرْصُوصِ
يَشُدُّ بَعْضُهُ بَعْضًا

ji xwe re bikin dustûra jiyânê; ji sefîliya dunyawî û ji şeqaweta uxrewî xelas bibin!

ALIYÊ ŞEŞAN: Heyata manewî û sihheta ubûdiyetê, bi edawet û înadê ji binî diheje.

Çunkî, îxlas ku wesîteya xelasiyê û wesîleya rizgariyê ye, wenda dibe. Lewre muennîdekî terefgir, di ‘emelên xwe yên xêran de, dixwaze ku tefewwuqî xasimê xwe bibe. Îca wisan bi rehetî, zû bi zû, di ‘emelên xwe yên xalîsen liwechîllah de, nikare muweffeq bibe. Bi ser de jî, di biryar û mu’emeleyên

xwe de, terefgirê xwe tercîh dike; nikare edaletê pêk bîne. Ha lewre ew Îxlas û Edalet ku esasên ef'al û 'emelên xêrê ne, ji ber xusûmet û edawetê, wenda dibin.

Ev Aliyê Şeşan, gelek dirêj e; feqet ji ber kurtbûna qabiliyeta meqêm, em kurt dibirin.

* * *

MEBHESÊ DUDUYAN

بِسْمِ اللَّهِ الرَّحْمَنِ الرَّحِيمِ

إِنَّ اللَّهَ هُوَ الرَّزَّاقُ ذُو الْقُوَّةِ الْمَتِينُ ﴿١﴾ وَكَأَيِّنْ
مِنْ دَابَّةٍ لَا تَحْمِلُ رِزْقَهَا اللَّهُ يَرْزُقُهَا وَإِيَّاكُمْ
وَهُوَ السَّمِيعُ الْعَلِيمُ

Gelî ehlê îmanê! Zerarê neyartiyê çi qas hebû, te berê fam kir. Hem fam bike ku merezeke herî bidehşet û muzir ku bi qandî neyartiyê, ji jiyana Îslamî re herî zêde bi dehşet e jî, hirs e. Hirs, sebebê destvalatî, îllet û zelîliyê ye û marûmî û sefîliyê bi xwe re tîne. Ew zelîlî û sefîliya gelê Cihû ku ji her mîletî zêdetir bi hirsê radiperikin dunyayê, ji vî hukmî re şahidekî qet'î ye. Belê hirs, di daîreya xwedîjiyanan de, ji daîreya herî fireh bigre, heta daîreya ferdekî cuz-î, tesîra xwe ya nebaş nîşan dide. Îca xwestina tewekkulwarî ya riziq, berevajiyê wê, medarê rehetiyê ye û li her derî, tesîra baş nîşan dide. Va ye darên fêkîdar û berên meywedar ku ji

awayekî ve xwedîjiyan in û muhtacî riziq in, ji ber ku bi tewekkulwarî û qenaetkarî li ciyê xwe disekinin; hirsê nîşan nadin, rizqê wan, ber bi wan ve baz dide tê. Ji heywanan gelek zêde weledan xwedî dikin. Îca heywan, ji ber ku bi hirsê li pey rizqên xwe dibezin, bi zor, zehmetî û noqsaniyetên gelek zêde, rizqên xwe bi dest dixin. Hem di nav daîreya heywanan de têjik, ji ber ku bi zimanê hal, zeîfî û neçariya xwe tewekkul dikin, rizqê wan ê meşrû û mukemmel û letîf, ji xezîneya rehmetê tê dayin; lê belê, cenewarên ku bi hirsê êrîşî rizqên xwe dikin, ew wan rizqên nemeşrû û nexweşik, bi zehmetiyên gelek zor qezenc dikin. Ha ev jî nîşan dide ku: **Hirs, sebebê marûmîyetê ye; lê tewekkul û qenaet ku hene, wesîleyên rehmetê ne.**

Hem di nav daîreya mirovahiyê de gelê Cihû ku ji her milletî zaftir bi hirsê, xwe bi dunyayê ve hişk digre û bi eşqê, xwe bi dunyayê ve girê dide, ji ber wê serweta nemeşrû ya ribayî ku ew bi zor û zehmetiyên mezin qezenc dike; lê belê feydeya wê ji wan re hindik e û hema tenê jê re xezînedarî dike, ji temamê miletan şîmaqa zelîlî û sefîliyê dixwe; rastî qetl û îxanetê tê, nîşan dide ku **hirs, kan û madena zelîlî û xesaretê ye.** Hem li ser ku mirovê hirskar, dikevin xesaretê, ew qas bûyer hene ku

الْحَرِيصُ خَائِبٌ خَاسِرٌ ketiye hukmê gotina pêşi-

yan û li ber çavê raya giştî, weke heqîqetêke giştî hatiye qebûlîkirin. **Madem himin wisan e, heke tu ji malî zaf hez dikî, ne bi hirsê; belkî bi qenaetê teleba malî bike; da ku zaf biêt.**

Dirûvê ehlê qenaet û ehlê hirsê dide du kesan ku diçin dîwanxaneyêke zatekî mezin. Yek ji wan, di dilê xwe de dibêje: “Hema tenê bila min biezimîne, ez ji sermayaya derve xelas bibim, besî min e. Heke îskemleya herî jêr jî bide min, ev lutf e.”

Mirovê dî, mîna ku heqqê wî hebe û her kes mecbûr be ku jê re hurmet bike, bi mexrûrî dibêje ku: “Divê ku îskemleya herî jor bide min.” Bi wê hirsê dikevê, çavê xwe berdide mewqiyên bilind û dixwaze ku biçe wan deran. Feqet xwediyê dîwanxaneyê, wî bi paş ve dizivirîne û li jêrê dide rûniştandin. Di vê rewşê de ciyê ku diviya jê re spas bike, li şûna malavahîpêdayîne, di dilê xwe jê hêrs dibe. Ne spas, berevajiyê wê, îca xwediyê xanê rexne dike. Li xwediyê xanê jî, giran tê û nerazîbûna xwe nîşan dide.

Mirovê ewil, bi awayekî nefspiçûkî dikevê, dixwaze ku li ser îskemleya herî jêr rûne. Ew qenaeta wî, li xweşa xwediyê dîwanxaneyê diçe. Dibêje: “Kerem bike biçe îskemleya hê jortir.” Îca ew jî, her ku diçe, spasiyên xwe zêdetir dike, memnûnbûna xwe, zaftir dike.

Eve dunya, dîwanxaneyeke Rehman e. Rûyê erdê, sofrayê rehmetê ye. Dereceyên rizqan û mertebeyên nîmetan, di hukmê îskemleyan de ne.

Hem di karûbarên herî piçûk de jî, her kes dikare tesîra nebaş a hirsê bibîne.

Mesela gava ku du parsek, tiştêkî dixwazin, li hember yê ku bi hirsê îlhah dike, her kes xwe li giranî datîne, sistî dike û nadê; lê belê li hember wî parsekê sakin, her kes di dilê xwe de pêjna merhemetê dike ku bidê.

Hem mesela, bi şevê, xewa te reviyaye, gava tu bixwazî rakevî, heke laqeyd bimînî, sersar bimînî, dibe ku xewa te bê. Heke bi hirsê tu xewê bixwazî û bibêjî “El eman ez rakevim, gidî ez rakevim,” tu dê bi temamî, xewa xwe bidî revandin.

Hem mesela: Ji bo encameke girîng, tu bi hirsê li benda yekî disekinî û dibêjî: “Gidî ev nehat, hawar ev çima nehat” û dawiya dawî, hirs sebra te diqedîne, tu radibî diçî; piştî deqîqeyekê ew mirov tê; çî heye ku ew encama girîng ku tu li benda wê bûy, xera dibe.

Sirrê van bûyeran ev e: Çawa ku çêbûna nanekî, li ser tertîba zevî, bêder, aş û firûnê/tendûrê ye, wisan jî, di tertîba tiştan de, teenniyeke hikmetê

heye. Ji ber sedemê hirsê, bela ku mirov bi teennî tevnagere, rîayetî wan pêlpêlûkên manewî yên bi-tertîb ku di tiştan de hene nake, îca yan bi ser wan de ferqaz dide dikeve; yan jî pêlpêlûkê kêr dihêle, nikare bigihîje meqsedê.

Ha, gelî birayên ku bi derdê debarê gêj bûne û bi hirsê dunyayê serxweş bûne! Hirs, digel ku tişteki ev qas muzir û bi bela ye, ka ev çi ye ku hûn di rêya hirsê de dikevin her zîletî û hûn ne dibêjin ev heram e, ne jî helal e, hema hûn her malî, demildest qebûl dikin û hûn gelek tiştên ku ji heyata axretî re lazim in, feda dikin; heta hûn wê zekata ku ruknekî girîng e erkanê Îslamê ye, di rêya hirsê de terk dikin! Hal ku hal e zekat, ji her kesî re, wesîleyeke bereketê ye û dafi'ekî belayan e. Ew kesê ku zekatê nade, himin û bêguman, bi qasî zekatê, dê malek ji destê wî derkeve; yan dê li haşê bide wan ciyên nelazim û beredayî; yan jî dê musîbetek bê û wê ji destê wî bigre.

Di xewneke xeyalî ya biheqîqet û gelek ecêb de, sala pêncan a Herba Giştî ya Pêşîn, ji min hat pirsîn:

“Ev birçîtî û wendabûna malî û zehmetiya bedenî ku hat serê Misilmanan, ji ber çi ye?”

Min di xewnê de gotibû:

“Cenabê Heq, ji dehan yekê (Haşiye-1) qismek malî, yan jî yekê ji çilê (Haşiye-2) hinek malî û yekê ji wî malê ku Wî bi xwe daye me, ji me xwest; da ku bi vî awayî bike ku duayên fuqerayan ji me re bide qezenckirin û pêşî li ber kîn, hesed û dexesiya wan bigre. Me ji ber hirsaxwe, timakarî, çikûsî kir û neda. Cenabê Heq, ew zekata wê ya ku ketibû ser hev, siyê ji çilî û heşt-ê ji dehan girt.

Hem Wî, salê tenê mehekê, birçîteyêke ku heftê hîkmet tê de hene, ji me xwest. Me gunehê xwe bi nefsa xwe anî, me xwe neda ber kişandina birçîteyêke demborî/miweqqet a bilezzet. Cenabê Heq, weke ceza, rojiyêke ku ji heftê aliyî ve bi bela bû, pênc salan bi cebrî û bi darê zorê, bi me da girtin.

Hem Wî, tenê yek saetekê ji bîst û çar saetan, bi awayekî ji awayan weke talîmateke Rebbanî ya ku xweş, ulwî, nûranî û bi feyde ye, ji me xwest. Me zexelî kir û me ew nimêj û niyaz pêk neanî. Me ew tek yek saet, xist nava wan saetên dî û

Haşiye-1: Ango ji malên mîna genim ku her sal nû dide, ji dehan yek.

Haşiye-2: Ango ji wî çilê ku berê dida, her sal, pirê caran bi hindikî, ji aliyê kara ticarî û nesla heywanan ve, ji wî çilî nû, deh tene dide.

wenda kir. Cenabê Heq, weke kefaretê wê, pênc salan bi talîm, talîmat û bezandinê, bi awayekî ji awayan, nimêj bi me da kirin.”

Peyre ez bi xwe ve hatim, fikirîm û min fam kir ku di wê xewna xeyalî de, rastî û heqîqeteke gelek girîng heye. Bi awayê ku di Kelîmeya Bîst û Pêncan de, di behsa wê muwazeneya medeniyetê û hukmê Quranê de, hatiye îsbatkirin û beyankirin, di jiyana beşerî ya civakî de, çavkanî û menşeya hemû bêexlaqî, îhtîlal û tevliheviyan, du kelîme ne:

Yek jê: “Piştî ku ez têr bim, kî ji birçînan dimre, ji min re çi?”

A duduyan: “Tu bixebite; ez bixwim.”

Tiştê ku van du kelîmeyan dide berdewamkirin, bizava faîzê û terka zekatê bi xwe ye. Tek çareya van du merezên bidehşet ên civakî, ku dê tedawî bike ew e ku zekat, weke dustûrekî giştî, bê îcrakirin û zekat bê bikeve jiyânê; riba jî bê heramkirin.

Hem ne tenê di nav şexs, cemaet û komên xusûsî de, belkî ji bo seadeta jiyânî ya hemû mirovahiyê, riknekî herî girîng; hetta stûn û dîrekekî herî girîng ê ji bo dewama jiyana mirovahiyê, zekat e. Lewre di nav mirovahiyê de xewas û ‘awam, du tebeqe hene. Tiştê ku dê temîn bike ku xewas li ‘awaman merhemet û îhsanê bike û tiştê ku bibe wesîle ku ‘awam jî, ji xewasan re hurmet û îtaetê bike, zekat bi

xwe ye. Yan na, ji jorê, bi serê ‘awaman ve zulûm û zordarî dadikeve û ji ‘awaman jî, li hember xewasan kîn û serhildan derdikeve. Ev her du tebeqeyên beşerî, dikevin nava mucadele û têkoşîneke daîmî ya manewî û di nav tevliheviyeke keşmekeşî û geremolî de dimînin. Bere bere, heta çawan ku li Rûsyayê jî bû, di teşeyê wê têkoşîna navbera ked û sermayeyê de, dest pê dikin, dikevin qirik û gewriya hev û din.

Gelî ehlê kerem û wicdanê! Ê gelî ehlê camêrî û îhsanê!

Heke îhsan ne bi navê zekatê bin, sê zerarên wan hene. Carcaran jî bê feyde diçin. Çimkî, ji ber ku tu, ne bi navê Xwedê didî, ji aliyê manewî ve tu minnet dikî; tu wî feqîrê bêçare, di bin esîrtiya minnetê de dihêlî. Hem ji wê duaya wî ya meqbûl, tu mehrûm dimînî. Hem digel ku di rastiye xwe de, ji bo ku malê Cenabê Heq, bidî îbadên Wî, tu memûrekî paykirinê yî jî; lê belê tu, xwe weke xwediyê mal dihesibînî û tu kufranê nîmetê û nankorî dikî. Heke tu bi navê zekatê bidî, ji ber ku tu, li ser navê Cenabê Heq didî, tu xêrekê qezenc dikî û tu, şukraneke nîmetê nîşan didî. Ew mirovê muhtac jî, ji ber ku mecbûr namîne ku xwe, bi te xweş bike, îzzeta nefsa wî naşikê û duaya wî, ji te re meqbûl dibe. Belê, de ka, di zekata ku îhsan belkî xêreke zêdetirî nafîleyê ye de gava mirov, bi awayên bêîxlas dide û zerarên mîna riya, şohret, minnet û zelîltiyê qezenc dike li kê derê!

Îca gava mirov bi navê zekatê wan qenciyan bike, hem ferzê eda bike, hem xêrê, hem îxlasê, hem jî duayeke meqbûl qezenc bike li kê derê?”

سُبْحَانَكَ لَا عِلْمَ لَنَا إِلَّا مَا عَلَّمْتَنَا
إِنَّكَ أَنْتَ الْعَلِيمُ الْحَكِيمُ¹

اللَّهُمَّ صَلِّ وَسَلِّمْ عَلَى سَيِّدِنَا مُحَمَّدٍ الَّذِي قَالَ:
الْمُؤْمِنُ لِلْمُؤْمِنِ كَالْبُنْيَانِ الْمَرْصُوصِ يَشُدُّ
بَعْضُهُ بَعْضًا وَقَالَ: الْقَنَاعَةُ كَنْزٌ لَا يَفْنَى
وَعَلَى إِلَهٍ وَصَحْبِهِ أَجْمَعِينَ أَمِينَ
وَالْحَمْدُ لِلَّهِ رَبِّ الْعَالَمِينَ²

* * *

1 Em Te, ji temamê sifetên noqsan tenzîh dikin. Ji xeynî wî ilmê ku Te, ew hînî me kiriye, ti ilmekî me yê dî tune ye. Bê guman Tu baş û têr bi her tiştî dizanî û Tu xwedî hîkmet î. (Sûreyê Beqere: 32)

2 Ya Rebbî, selat û selam li ser wî seyyîdê me Muhemmedê ku gotiye “Mumîn, ji bo hev mîna wî dîwarî ne ku bi risasê hatiye lêkirin, hev distrînin” û dîsa wî gotiye ku “Qenaet, xizneyeke wisan e ku naqede.” Û dîsa selat û selam li ser al û eshabiyên wî gişt be. Amîn. Hemd ji Rebbîlalemîn re be.

XATÎME

DERBARÊ XIYBETÊ DE YE

بِسْمِهِ وَإِنْ مِنْ شَيْءٍ إِلَّا يُسَبِّحُ بِحَمْدِهِ

Tenê yek ayeteke ku ji mînakên meqama zem û zecrê ya Nuqteya Pêncan a Şûaya Yekê ya Şûleya Yekê ya Kelîmeya Bîst û Pêncan e ku bi şeş awayên mûcîzeyî, ji xiybetê dide nefretkirinê. Ev yek bi temamî nîşan dide ku xiybet di nezera Quranê de tişteki çiqas kirêt e. Ji ber vê, ji beyanên din re îhtiyaç nehiştiye. **Belê piştî beyana Quranê beyan nabe û jixwe îhtiyaç jî tune ye.**

Ha di ayeta

أَيُّحِبُّ أَحَدُكُمْ أَنْ يَأْكُلَ لَحْمَ أَخِيهِ مَيْتًا

de zemê şeş dereceyan zemm dike. Ji xiybetê, şeş dereceyan bi awayekî şedîd zecir dike. Gava ev ayet arasteyî kesên ku bi rastî paşgotiniyê dikin bibe, wateya wê bi vî teherê ku dê bêt dibe:

Me'lûm e, hemzeya serê ayetê, di wateya pirskirinê, “aya/gelo”yê de ye. Ew wateya pirskirinê, mîna avê dikeve nav temamê kelîmeyên ayetê. Di kelîmeyekê de hukmekî zimnî heye.

Va ye Yekê, bi hemzeye dibêje: “Gelo aqilê we ku ciyê pirs û bersivê ye, tune ye ku tiştê ev çend kirêt fêm nake?”

Ya Duduyan, bi lefzê: ¹ يُحِبُّ ye dibêje: “Gelo dilê we ku ciyê hezkirin û nefretê ye, qey xera bûye ku ji karekî wiha herî menfûr û nefrînkirî hez dike?”

Ya Sisêyan: bi kelîmeya ² أَحْذَكُمْ ê dibêje: “Çi hatiye serê jiyana we ya civakî û bajarî ya we ya ku heyata xwe ji cemaetê digre ku ‘emelekî wiha qebûl dike û heyata we bi jehrê dixê?”

Ya Çaran: bi kelimê ³ أَنْ يَأْكُلَ لَحْمَ dibêje: “Çi bûye bi însaniyeta we ku hûn, mîna cinawiran, hevalê xwe didin ber gez û diranan û wiha parçe dikin?”

1 Li xweşa wî diçe.

2 Yek ji we.

3 Xwarina goştê wî.

Ya Pêncan: bi kelîmeya ¹ أَخِيه yê dibêje: “Gelo we hîç rîqqeta cinsî û silaya rehmê nîn e ku hûn, şexsê manewî yê mezlûmekî ku weha ji gelek aliyên ve birayê we ye, bi bêînsafî didin ber diranan. Gelo ev qet aqilê we tune ye ku hûn azayê birayê xwe, bi diranê xwe mîna dîneharan gez dikin?”

Ya Şeşan: bi kelimê ² مَيْتًا ê dibêje: “Wicdanê we li kê derê ye gelo, qey fitreta we xera bûye ku hûn li hember birayekî xwe yî mirî/rehmetî ku di halekî herî muhterem de ye, karekî herî mustekreh û îkrahî ku xwarina goştê wan e, hûn dikin?”

Nexwe bi îfadeya vê ayetê û bi delîliya cihê cihê ya van kelîmeyan: **Zem û xiybet ji aliyê aqil, dil û însaniyet û wicdan û fitret û esabiyet û milliyetê ve mezmûm û şermezarkirî ye.** Va ye mêze bike! Çawan ku ev ayet, bi awayekî îcazkarî, zemmê şeş dereceyan zemm dike, bi awayekî î'cazkarî, şeş dereceyan ji wê cirmê zecir dike.

Xiybet, çekeke altax e ku ehlê edawet, hesed û înadê, herî zêde wê bi kar tîne. Yê ku xwedî îzzeta nefsê be, tenezzulî vê sîleha pîs nake û wê bi kar nayîne. Çawa ku zatekî navdar gotiye:

1 Birayê wî.

2 Yê/ya ku miriye.

أَكْبَرُ نَفْسِي عَنْ جَزَاءِ بَغِيْبَةٍ
فَكُلُّ اغْتِيَابٍ جَهْدٌ مَنْ لَالَهُ جَهْدٌ

Ango: “Ez nefsa xwe qedirbilind dibînim ku bi xiybetê ceza bidim dijminê xwe û tenezzulî wê nakim. Çunkî xiybet, çeka yên qels, zelîl û kême-jêran e.”

Xiybet ew e ku: Ew mirovê ku xiybeta wî tê kirin, heke hazir bûya û deng biçûyayê, dê jê îkrahî bikira û bixeyidiya. Heke rast bibêje, jixwe xiybet e. Heke derew bike, hem xiybet e, hem îftîra/nebûkarî ye. Gunehekî çirkîn/kirêt ê duqatî ye.

Xiybet tenê di çend ciyan de dibe ku caîz be.

Yek jê: Di sûretê gili û şikayetê de, ji mirovekî wezîfedar re dibêje; da ku alîkarî pê re bike û wî munkerî, wî qebehetî ji wî rake û heqqê wî, ji wî bistîne.

Yek jî jê: Mirovek dixwaze ku pê re şîrîkatî bike û bi hev re bişixule. Tê ji te pîrsa wî dike, bi te re meşweret dike. Tu jî, heke sirf ji bo meslehetê, bi awayekî bêxerez, ji bo ku tu heqqê meşweretê eda bikî, bibêjî: “Bi wî re şîrîkatiyê meke. Çunkî tu dê zerar bibînî.”

Yek jî jê: Meqseda wî, ne heqaret û teşhîr e, belkî meqseda wî pê ew e ku wî tarîf bike û bide naskirin û ji bo vê yekê gava bibêje: “Ew mirovê kulek û serserî çû filan ciyê.”

Yek jî jê: Ew kesê ku xiybeta wî tê kirin, fasiqê mutecahir e. Ango ji neçêtiyê natengije; belkî bi wan gunehên ku dike, îftîxar dike; bi zulma xwe lezzetê digre û bi awayekî aşkera, bêyî ku dilê wî teng bibe, gunehan dike.

Ha di van xalan de, bi awayekî bêxerez, sirf ji bo heq û meslehetê, xiybet caîz dibe. Heke ne wisan be, çawa ku agir êzingan dixwe diqedîne, xiybet jî, ‘emelên salih dixwe diqedîne.

Gava xiybet kir an jî bi dilê xwe, bi hemdê xwe lê guhdarî kir, divê bibêje

اللَّهُمَّ اغْفِرْ لَنَا وَلِمَنْ اغْتَبْنَا

peyre çi weqtê gava rastî mirovê ku xiybeta wî kiriye hat, divê ku bibêje: “Min helal bike.”

الْبَاقِي هُوَ الْبَاقِي

Seîdê Nûrsî

* * *

EV PARÇE GELEK HÊJA YE

Nukteya Pêşî: Cenabê Heq, ji ber kemala kerem, merhemet û edaleta xwe, di nav qencyê de, mukafateke mu'eccel bi cî kiriye û di nav xerabiyan de jî, mucazateke mu'eccel derc kiriye. Wî, lezzetên manewî ku dê xêra axretê bîne bîra mirov, di nav heseneyan de bi cî kiriye û Wî, cezayên manewî ku dê ezabê axretê bi mirovan bide hisandin, di nav gunehan de bi cî kiriye.

Mesela: Muhebbeta di navbera mumînan de, ji bo ehlê îmanê, heseneyeke xweşik e. Lezzeteke manewî, zewqek û dilrehetiyeke ku xêr û sewaba maddî ya axretê bîne bîra mirovan, di nav wê heseneyê de hatiye bicîkirin. Her kes, gava serî li dilê xwe bide, bi vê zewqê dihesê.

Mesela: Xusûmet û edawet, di navbera mumînan de gunehek e. Di nav wî gunehî de, ezabekî wicdanî ku dil û ruhan, bi acizbûnan difetisîne, bi ruhên alîcenab dide hisandin. Min bi xwe, belkî sed carî tecrube kiriye ku: Gava min bi birayekî mumîn re neyartî dikir, min ji ber wê neyartiyê ezabekî wisan dikşand ku... Vê ti şik û guman nedihîşt ku ev, ji vî

gunehê min re cezayekî mu'eccel e, bi min tê kişandin.

Mesela: Hurmeta ji wan zatên ku layiqê hurmetê ne re tê kirin û ew merhemet û xîzmeta ku ji wan ên ku layiqê merhemetê ne re tê kirin, heseneyek e, qenciyekek e. Di nav vê qenciye de, zewqa lezzetê wisan heye ku xêra uxrewî dide îhsaskirin û mirov, wê hurmet û merhemetê wisa bi pêş dixe ku heta jiyana xwe jî feda dike. Dayik, bi wesîteya wê şefqet û mukafata ku di merhemeta wê ya li zarokên wê de heye, diçe digihîje wê dereceyê ku jiyana xwe di rêya merhemetê de feda dike. Mirîşka ku ji bo xelaskirina têjika xwe êrîşî şêran dike, di nav miletê heywanan de, ji bo vê heqîqetê mînak e. **Nexwe di merhemet û hurmetê de mukafateke mu'eccel heye. Mirovên alîhîmmet û alîcenab, pêjna van dike ku dikevin rewşê qehremanî.**

Hem mesela: Di hirs û îsrafê de cezayekî wisan heye ku ew cezayê bigilî û gazine, mereqawer, manewî û dilî, mirovan keregêj dike. Îca di hesed û dexesiyê de cezayekî mu'eccel ê wisan heye ku ew hesed, xwediyê xwe yê ku hesedê dike, dişewitîne.

Hem di tewekkul û qenaetê de mukafeteke wisan heye ku ew xêra bilezzet û mu'eccel, wê belaya feqr û hacetan û elema wan, îzale dike û ji holê radike.

Hem mesela: di xurûr û kibrê de barekî wisan giran heye ku: Mirovê mexrûr û qure, ji her kesî dixwaze ku jê re hurmetê bikin; îca ji ber sedemê vê xwestinê jî, dilgiranî û cangiraniyê dibîne; lewre dikeve nav ezabekî daîmî. **Erê, hurmet tê kirin; bes nayête xwestin.**

Hem mesela: Di nefspiçûkî û terka enaniyetê de mukafeteke wisan bilezzet heye ku xwe, ji barekî giran û ji xweecibandina sar xelas dike.

Hem mesela: Di sûtî-zan û sûtî tewîlê de, li vê dunyayê, cezayekî mu'eccel heye. Bi qaydeyê “Men deqqe, duqqe” yê ku sûtîzen dike, rastî sûtîzennê tê. Liv û tevgerên kesên ku liv û tevgerên birayê xwe yê mumîn sûtî tewîl dike, di demeke kurt de, rastî sûtî tewîlê tê; cezayê xwe dikşîne. Û mîna van... Temamê exlaqê hesene û seyyîe, divê ku li gor vê muqayeseyê bête pîvandî.

Ez ji rehmeta Îlahî hêvîdar im, ew zatên ku wê î'caza Qurânî ya manewî ku vî zemanî, ji Rîsaleyên Nûr derdikeve tehm dikin, pêjna van zewqên manewî dikin, înşallah dê nebin mubtelayê exlaqê nebaş...

* * *

Nuqteya Sisêyan:

Desîseyeke şeytanî ya ku jiyana civakî ya mirovan dibe fesadê ev e ku: Bi tek gunehêkî yek mumînekî, ser temamê xêrên wî digre. Bêînsafên ku li vê desîseya şeytên guhdarî dikin, neyartî bi mumînan re dikin. Hal ku hal e Cenabê Heq, gava ku roja Heşrê, bi edaleta mutleq, li mêzîna xwe ya mezintirîn ‘emelên mukellefan dikşîne, li gor xalibiyet an jî mexlûbiyeta xêran a li hember gunehan hukum dide. Hem ji ber ku sedemên gunehan zêde ne û hebûna wan jî hêsa ye, carcarinan bi tek yek xêrekê, ser gelek gunehên wan digre û dinixumîne. Nexwe li vê dunyayê, ji hêla wê edaleta Îlahî ve, divê muamele bête kirin. Heke xêrên mirovekî, li hember xerabiyên wî, ji hêla kemmiyet an jî keyfîyetê ve zêde bîn, ew mirov, musteheqê muhebbet û hurmetê ye. Belkî ji ber xêreke wî ya hêja, divê ku bi çavê efûyê li gelek xirabiyên wî bête nihêrtin. Hal ku hal e, mirov ji ber demarê zulmê ku di fitretê de heye û bi telqîn û navtêdana şeytên, sed xêrên zatekî, ji ber yek gunehêkî wî, jibîra dike; neyartî bi birayê xwe yê mumîn re dike, dikeve gunehan. Çawa gava ku perê mêşekê li ser çavê mirov bête danîn, çiyayekî dinixumîne; nîşan nade. Wisan jî:

Mirov, bi demarê xerezê, bi gunehêkî bi qasî perê mêşê, ser xêrên bi qasî çiyayan digre, dipeçilîne, jibîra dike, bi birayê xwe yê mumîn re neyartî dike; di jiyana civakî ya mirovan de, dibe aletekî fesadê.

* * *

Kelîmeya Çaran:

Di temamê jiyana xwe de, tiştê ku min ji jiyana civakî ya mirovahiyê, bi awayekî qet'î derxistiye û dîtiye û encama ku lêgerînan daye min ev e ku: **Tiştê herî zêde ku layiqê muhebbetê ye, muhebbet e û sifeta ku herî zêde layiqî neyartiyê ye, xusûmet e. Ango sifeta muhebbet û hezkirinê ku jiyana civakî ya mirovahiyê temîn dike û wê sewqî seadetê dike, herî zêde layiqî hezkirin û muhebbetê ye. Îca dijminahî û neyartî ku jiyana civakî ya mirovahiyê serabin dike, ji her tiştî zaftir musteheqê nefret û neyartiyê ye û musteheq e ku mirov xwe ji wê vekişîne û sifeteke çirkîn û zerarkir e. Ev heqîqet, ji ber ku têra xwe, bi berfirehî di Nameya Bîst û Duduyan a Rîsaleyên Nûr de hatiye beyankirin, em li vê derê îşareteke wiha kurt dikin:**

Weqtê xusûmet û edawetê qediya. Du Herbên Giştî, nîşan da ku edawet çî qas fena û texrîbkar e û zulmeke çendîn bi dehşet e. Tezahur bû ku tê de ti faydeyek tune ye. Nexwe xirabî û guneyên dijminên me, –bi şertê ku êrîş nekin– bila neyartiya me nekşîne. Cehennem û ezabê Îlahî têra wan dike...

Yekcaran, xurûr û nefisperestiya mirovan, bi bêşuûrî, li hember ehlê îmanê, bi awayekî neheq, neyartî dike; pê re jî zenn dike ku mafdar e. Hal ku hal e, bi vê xusûmet û neyartiyê, wisan dike, wan sedemên qewî yên mîna îman, Îslamiyet û cinsiyetê ku ji hezkirina ji ehlê îmanê re dibin wesîleya muhebbetê, piçûk dixîne û wan ji qîmeta wan dadixîne. Îca ev ku heye, dînîtiyeke wisan e ku wan sedemên bêqîmet ên neyartiyê, li hember wan sedemên bi qasî çiyayan ên muhebbetê tercîh dike. Himin muhebbet dijberî neyartiyê ye, mîna ronahî û tarîtiyê, nikarin bi rastî biêtin cem hev. Sedemên kîjan ji wan xalib be, ew, dê bi tevî heqîqeta xwe di dilî de bimîne. Dijberê wê, tevî heqîqeta xwe, dê dilî de nebe. Mesela: Gava ku muhebbet, bi tevî heqîqeta xwe tê de hebe, yekser ew neyartî werdigere şefqet û dîlpêêşandinê. Weziyeta li hember ehlê îmanê ev e. Îca gava ku neyartî, bi heqîqeta xwe di dilî de hebe, wê weqtê ew muhebbet, werdigere sûretê mumaşaat û têkilnebûnê û bi awayê zahirî xwe dost nîşan dide. Îca ev ku heye, li hember ehlê

dalaletê ku êrîş nake, pêkan e ku bibe. **Belê, sedemên muhebbetê, ew zincîrên qewî, nûranî û kelehên manewî yên mîna îman, Îslamiyet, cinsiyet û însaniyetê ne.** Sedemên neyartiyê, li hember ehlê îmanê, hin sedemên xusûsî yên mîna xîçikên keviran in. Nexwe, yê ku li hember Muslumanekî, heqîqî neyartî dike, xetayekî wisan mezin dike ku wan sedemên bi qasî çiyayan ên muhebbetê biçûk dixîne.

Elhasil: Muhebbet, uxûwwet, hezkirin, mîzaca Îslamiyetê ye û rabiteya wê ye. Mîzaca ehlê edawetê, mîna mîzaca xerabûyî ya sebiyekî ye ku dixwaze bigrî, îca li sedemekî digere ku li serê bigrî. Tiştekî negirîng ê mîna perikê mêşê, ji giriyê wî re dibe hincet. Hem dirûvê wan dide mirovekî bedbîn û bêînsaf ê heta ku îmkana zenna nebaş hebe, zenna baş nake; bi yek gunehekî, ser deh xêran digre. Îca însaf û zenna baş ku seciyeya Îslamê ye, vê yekê redd dike.

* * *

Gelî Birayên Min ên Ezîz û Siddîq!

Ez metirsiyeke ku ji nişkê ve hatiye rûhê min, beyan dikim:

Ez bi vê hisiyam û min fam kir ku ehlê dalaletê, ji ber ku nikarin li hember şûrên almasî yên Rîsaleyên Nûr muqabele bikin, dixwazin ku ji hêla derdê debarê ve û ji xefleta demsala biharê îstîfade bikin û di nav şagirtên wê de meşreban çêbikin, an jî dixwazin ji muxalefeta hestên wan, hin demarên qels bibînin û hevgirtin û tesanuda navbera şagirtan ji binî bihejînin. **Nebî ncbî! Gelck baldar bin! Bila mubayenetek nekeve nav we. Mirov, nikare ji xetayan xalî bibe. Lê belê deriyê tewbeyê vekirî ye. Gava ku nefis û şeytan, wan hûn sewqî wê yekê kirin ku hûn li birayê xwe îtîraz bikin û bi awayekî mafdar wan rexne bikin, wiha bibêjin:** “Em, wisan ne huqûqên xwe yên wiha cuz-î, belkî em berpirsiyar in ku jiyana xwe û heysiyeta xwe û seadeta xwe ya dunyayî, ji bo wê tesanuda ku rabiteya herî hêzdar a Rîsaleyên Nûr e, feda bikin. Ji ber wê encama ku ew bi me dide qezenckirin, ji me re wezîfe ye ku em, her tiştê ku eydê dunyayê û enaniyetê ne, feda bikin.” û nefsa xwe bidin hişkirin!.. Heke meseleyek hebe

**ku we mecbûrî nîza'ê bike, meşweret bikin, wi-
san zêde kûr nekin, nabe ku her kes di yek meş-
rebekî de be. A niha elzem e ku hûn bi musemehî
li hev binihêrin.**

Ji hemû birayên xwe re em yeko yeko selam
dikin.

Seîdê Nûrsî

* * *

[Ji bo uxuwwetê, ez dê dustûrekî beyan bikim ku wî dustûrî, îlhez divê hûn jidil li ber çavan bigrin.]

Heyat, encama wehdet û îttîhadê ye. Gava ku ew îttîhada îmtîzackarî diçe, heyata manewî jî diçe.

Çawa ku **وَلَا تَنَازَعُوا فَتَفْشَلُوا وَتَذْهَبَ رِيحُكُمْ**

destnîşan dike, heke tesanud xera bibe, tehma cemaetê direve. Hûn dizanin ku sê elîf, gava cihê cihê bêtin nivîsandin, qîmeta wan sisê ye; heke bi tesanuda edetî bêtin nivîsandin, di qîmeta sed û deh û yekê de ye. Eynî mîna wan, sê-çar xîzmetkarên heq ên mîna we, gava ku cihê cihê bin û teqşîmul'emel nekin, bi qasî sê-çar mirovan in. Heke bi uxuwweteke heqîqî, bi tesanudeke ku bi fezîletên hev û di îftîxar bikin û bi sirrê tefaniyê ku weke ku eynî mîna hev bin, tevbigerin, ew çar mirov, di qîmeta qeweta çar sed mirovan de ne. Hûn, ne tenê Îspartaya gir a qerase, belkî hûn di hukmê makînîstên elektrîkên wisan de ne ku dikarin welatekî mezin ronahî bikin. Çerxên makîneyê, mecbûr in ku alîkariya hev bikin. Dexesiya hev

nakin, belkî berevajiyê wê, ji qeweta hev a zêde, memnûn dibin. Em ferz bikin, çerxek gava ku bi şuûr be, dema ku çerxeke hêzdartir bibîne, dilxweş dibe. Çunkî ew, wezîfeya wê, sivik dike. Zatên ku xezîneyeke mezin a qedirbilind ku xîzmeta Heq û heqîqetê; xîzmeta Quran û îmanê ye didin ser milê xwe, gava ku mil û mêxên hêzdar jî dikevin bin vî barî, bi wan îftîxar dikin, minetdar dibin û şukur dikin. **Nebî ku hûn deriyê rexneyê li hev vekin. Kesên li derveyê daîreya birayên we ku dê bêne rexnekirin, gelek in. Ez çawa bi meziyetên we dipesinim û çawa gava her ku ez ji wan meziyetan mahrûm dimînim, îca gava ku bi we re hene, ez memnûn dibim, weke ku ew meziyet, ên min bin, ez wisan qebûl dikim. Hûn jî, divê bi çavê seydayê xwe li hev binihêrin, heta divê ku her yek ji we, ji fezîletên birayê xwe re bibe naşir.**

Ji birayên me, Hafîz Elî Efendiyê Îslamkoyî, hesteke uxuwwetî nîşanî birayekî me yê dî da ku ew jî, dikarîbû bibûya hevrikekî wî. Îca min ev hesta wî, gelek hêja dît; lewre ji we re beyan dikim:

Ew zat hat ba min, min jê re got ku: “Xetta wî yê dî, ji xetta te baştir e. Ew dê hîna zêdetir xîzmetê bike.” Min bala xwe dayê ku Hafîz Elî, bi samî-mîyeteke kemilî û bi kemala îxlasê, bi tefewwuqa wî, îftîxar kir û pê lezzet girt. Hem ji ber ku wî, bala

muhebbeta seydayê xwe celb kir, memnûn bû. Îca min bala xwe da dilê wî ku ne ji bo xwexweşkirinê ye; min pêjn kir ku ji dil e. Min ji Cenabê Heq re şukur kir ku di nav birayên min de hin bira hene ku ev hesta bala, bi wan re heye. Înşellah ev hest, dê xîzmeta mezin bike. Elhemdulillah, ev hest, bere bere diteyise birayên me yên li vî cîwarî.

* * *

بِسْمِهِ سُبْحَانَهُ

Birayên Min ên Ezîz û Siddîq!

Li vê dinyayê, nemaze di vî zemanî de, bi xusûsî ji kesên ku ketine musîbetê û bi taybetî ji şagirtên Nûrê re, li hember tengasiyên bidehşet û bêhêvîmayinan, çareya herî bitesîr ew e ku: Hûn tesellî û ferahê bidin hev; hûn quwweya hev a manewî qewî bikin û mîna birayên fedakar û heqîqî, hûn jî xem, huzun û acizbûnên hev melhem bikin û bi şefqeteke tam, hûn dilê hev ên bikeder xweş bikin. Uxuwweta heqîqî û uxrewî ya navbera we, nikare dilmayin û terefgiriyê ragre. Himin min bi temamê hêza xwe, îtîmad bi we aniye û min piştî xwe bi we girtiye û ji bo we, min ne tenê îstrehet, heysiyet û şerefa xwe, belkî çawa ku hûn jî dizanin, min biryar daye ku ez dikarim bi dilrehetî û kêfxweşî, rûhê xwe jî feda bikim, belkî jî hûn vê dibînin. Hetta bi sonda qesemê ez temîn dikim ku ev heşt roj in, wê bûyera bêqîmet ku du ruknên Nûrê, ciyê ku bi awayê zahirî naziyan li hev bikin û teselliyê bidin hev, îca ku wan xemgînî da hev, van rojan ezab da dilê min. Lewma hem rûhê min, hem dilê min, hem jî aqilê min feryad kir:

“Hey wax! Hey wax! El eman! El eman! Ya Erhemerrahimîn hawar! Me muhefeze bike! Me ji şerrê şeytanên cin û insî xelas bike! Dilên birayên min, li hember hev, bi sedeqet û muhebbet û uxuwwet û şefqeta tam dagre! û ew giriyan.

Gelî birayên min ên ku mîna hesin in û nahejin! Alîkarî bi min re bikin. Meseleya me gelek nazik e. Min wisan zêde baweriya xwe dabû ser we ku min, temamê wezîfeyên xwe, ji şexsê we yê manewî re hiştibûn. Divê ku hûn jî, bi temamê qeweta xwe, bazdin hawara min. Bi rastî, bûyera we, gelek cuz-î, demborî û piçûk bû; bes hema tayek, zerrekokek be jî, gava bête zenberek saeta me, bîvika çavê me, pê diêşe. Û ev xal jî girîng e ku sê rûdan û qewimînên maddî û sê müşahedeyên manewî, yek bi yek, bi temamî wan ev agahî da.

Seîdê Nûrsî

* * *

بِسْمِهِ سُبْحَانَهُ

Birayên Min ên Ezîz, Siddîq û Muxlîs!

Hatiye dereceya wacibiyê ku em, li gor derfetan, bi temamê hêza xwe, dustûrên Lem'eya Îxlasê û sirrên îxlasa heqîqî, di navbera xwe de, li hember hev bi kar bînin. Min agahiya qet'î girt ku: Ev serê sê mehan e ku sê mirov hatine tayînkirin da ku bi îxtîlafa fikir û meşrebê, birayên me yên xas ên li vê derê, ji hev û dî sar bikin.

Hem ji bo ku Nûrperwerên metîn, bikerixînin û uxuwweta wan bihejînin û wan ên nazik û tehemmulhindik bixin metirsiyan û ji xizmeta Nûrê bidin bidûrxistin, bi awayekî bêsedem, mehkemeya me dirêj dikin. Nebî nebî! Ev uxuwweta fedakarane û muhebbeta samîmane ya heta niha ku di navbera me de hebû, bila xera nebe. Hema bi qasî zereyekê be jî, zerarê mezin dide me. **Xîzmeta me ya Quran û îmanê, pêdivî dibîne ku gava lazim bike, ji bo hev, em rûhê xwe feda bikin. Digel vê yekê, ji ber wê tîfîziya ku ji tengasî yan jî ji tiştên dî tê, nabe ku fedakarên heqîqî, ji hev bixeyidin; belkî, bi kemala mehwiyyet û nefspiçûkî û teslîmiyyetê, qusûrê digre ser xwe; hewl dide ku muhebbeta**

xwe, samîmiyeta xwe zêde bike. Heke em wisan nekin û em hebbê bikin qubbe, dibe ku zerarekî wisan bide me ku neyête tamîrkin. Ez hewaleyî feraseta we dikim, kurt dibirim.

Seîdê Nûrsî

* * *

Ez ji birayên xwe tika dikim ku:

Ji ber tengijiyê, yan ji tengasiyên ruhî, yan ji tîtiziyê, yan berbayketina fêl û fendên nefîs û şeytên, yan ji ber bê hemdiyê; ji peyvên fena û kirêt ên ku ji devê hevalan dertên ji hev nexeyidin û nebêjin “li heysiyeta min ket”. Ez wan peyvên fena digrim ser xwe. Bila li telê we nekeve. Heke min hezar heysiyet hebin, ez dikarim ji bo muhebbet û biratiya nabeyna birayên xwe feda bikim.

Seîdê Nûrsî



